Kurdistan

PDK-S
Partiya Demokrata Kurdistan - Sûriya
1957

Rojnameyek ji aliyê ragihandina navendî ya PDK-Sê ve tê weşandin


Çirya Pêşîn / 15 - 10 - 2020

Kurdistan-Hejmar (183)

www.pdk-s.com

# Bi vekirina dergehên ligel deverên rejîmê rewşa tenduristî zehmetir dibe

Kurdistan **Şîlan Ehmo**




Rêveberiya Partiya Yekîtiya Demokratîk PYDê, tevahiya dergehên ligel rejîma Esed di riwê çûnûhatina welatiyan de vekir, ew jî jibilî dergehê Sêmalka yê ligel Herêma Kurdistanê çûnûhatin têde sînordarkirî dimîne. Ev yek di demekê de ye ku hejmara pêketiyên korona li Kurdistana Sûriyê roj bi roj zêde dibe. Welatiyên Kurdistana Sûriyê jî hin dibînin ku ev biryar biryareke şaş e û dê rewşê li deverên wan xerabtir dike, hin jî dibênin ku dê rewşa abûriya wan baştir bibe.Civan Omer wiha li ser vê mijarê dibêje, bi rsatî rewşa her ku diçe xerabtir dibe û êdî nexweşî li her deverekê belav bûye û nema tê kontrolkirin û ta baş e ku tiştek neyê girtin û em serderiyê ligel vê vayrosê de bikin heta ku bergiriya laşê xelkê çê bibe.
Jiyan Mihemed jî dibêje, bi vekirina van dergehan dê rewşa deverên me ji aliyê tenduristî ve zehmetir bibe, ji ber ku kerta tenduristî ne bihêz e.

# PDK-S serkirde û xebatkarê navdarê Kurd Nûredîn Zaza li Lozanê bibîr anî

Kurdistan- Evîn Oso

Li bajarê Lozan yê Siwêsra, Partiya Demokrata Kurdistan-Sûriya PDK-S bi amadebûna hejmareke serkirdeyên wê û amadebûna malbata Nûredîn Zaza û hejmareke kesayetî û Kurdistanî li Ewropa Nûredîn Zaza hate bibîr anîn. Di bîranînê de gotina Partiya Demokrata Kurdistan-Sûriya PDK-S û malbata Zaza hate xwendin, û gul jî li ser gora wî ji aliyê beşdarbûyan ve hatin danîn. Bi vê boneyê Serok Barzanî peyamek di derbarê de belav kir û tê de wiha ragehandin: Bi navê xwedayê mezin û dilovan, Sîh û du sal li ser koça dawî ya têkoşer û xebatkarê Kurd Dr Nuredîn Zaza derbas dibe. Nuredîn Zaza damezrênerê Partiya Demokrata Kurd li Sûriye û Sekreterê Yekemê Partiya Kurdî bû ku li Sûriye dest bi çalakiyên siyasî kir.
Xwedê jêrazî Nuredîn Zaza ji malbateke niştimanperwer û şoreşgerê Kurd bû ku temenê xwe li xebata siyasî û rewşenbîriya bi navê doza rewaya gelê xwe da serf kir û li wê rêyê da koçberî û zîndaniyê jî dîtiye.
Niha di demek da bîranîna xwedê jêrazî Nuredîn Zaza dikîn ku paşeroja gelê Kurd li Sûriye rûbirûyê gefên mezin bûye. Pêwîste bi hewla hemû aliyek û berdewambûna wê xebata siyasiya Nuredîn Zaza û hevalên wî berd û kevirê binaxe û bingehê bûn, mafê rewayê gelê Kurd li Sûriye biçespê û dawiya bi êşên Kurd li Sûriye bê anîn.
Li dawiyê de bîranîna xwedê jêrazî Nuredîn Zaza bi bilind radigrîn û hêviya serkeftinê ji bo hemû azadîxwazan û niştimanperwerên gelê Kurd û pêkanîna armancên rêbaza Kurdayetiyê dixwazin.
Nûredîn Zaza kî ye: Zaza (1919 - 1988), kurê Yûsif ji malbatek welatparêz û netewperwer bû.
Di sala 1919an da li Paloyê nêzîkî Amed hat ser rûyê dinê. Malbata wî tevlî şoreşa Şêx Seîd bûn, ji bo wê yekê bav û birayê wî Dr. Nafiz hatin girtin. Piştî berdana wan bi birayê xwe re hate binxetê temenê wî nêzîkî heft sal bû. Li Qamişlo cih girtin.
Dr. Nafiz bijîşk bû û Nûredîn dixwend ta ku diploma bekalorya yê sitand û çû Kurdistana Îraqê û li Bexdayê hate girtin. Piştî berdana wî berê xwe da Libnanê û xwendina xwe ya Zanîngehê xilas kir. Paşê çû Swîsre û xwendina bilind(dektora) di ilmê civakî de di sala 1956an da sitand.
Dema ku xwendina xwe li wir dikir têkiliyên wî ji milet qut nebûn û komela xwendevanên kurd li Ewropa çêkir. Careke dîn vegeriya Sûrîya û piştgirîkir di damezrandina Partiya Demokrat ên Kurd li Sûrya û ev partî ji aliyê Hemîd Derwêş, Hemze yê Niwêran û Osman Sebrî di 14.6.1957an da hat damezrandin. Piştî salekê ji damezrandinê, tevlê bû û ew bû Serokê Partiyê. Dema ku rewş li Sûriya nexweş bû di sala 1960an da hate girtin. Di gotina xwe da ku dabû Dadvanê ewlekariya dewletê gotibu (...divê ku hûn zanibin rastiya hebûna miletê kurd li ser qada xwe li bakurê komara Erebî ya yekbûyî, ji mêj ve ta niha bi biraderê xwe yê Ereb re ,ew miletekî xwedî ziman û folklor û kevnetorekî taybete...û girêdana wî bi van tişta nebû ye cihê jihevçûnê û nexweşiyê di nav bera kurd û Ereb de..). Di sala 1962an da wek nûnerê partî yê, bi xurtî tevlî Hilbijartina parlmentoyê bû.
Lê, ji ber ku lîstik û planên hêzê dewletê ew serneket. Di sala 1963an da ew û Cegerxwîn hatin dûrxistin.
Nerînên Dr. Nûredîn yên pêşketî û zanistî, di wê demê de dûrbûnek di navbera wî û gelek hevalê wî yên xebatê de çêkir. Mamosta Hemîd li ser vê yekê dibêjê komîta navîn biryarek hişk di derheqê Dr. Nûredîn de sitandin, dûrxistin ji partî û şerê wî dinav millet de kirin, bi wê yekê mirovekî welatperwer tune kirin, wê gelek xizmet ji partiya me û tevgera kurdî re kiriba. Ew biryar bû sedema sereka ku Dr. Nûredîn ji Sûriya derket ..).
Di sala 1967an da vegeriya Turkiyeyê û di sala 1970an de çû Swîsreyê û di 07.10.1988an de jiyana xwe li vir ji dest da.
Xebata wî ne tenê di warê siyasî de bû. Ew li Sûriyê xwe digihîne Celadet Bedir-Xan û di kovara Hawarê de dest bi nivîsandina kurteçîrokan dike. Memê Alan bi tîpên latînî çapkir, Şivanê Kurd ya Erebê Şemo wergerand û pirtûkek bi navê bangek ji bo miletê kurd di sala 1982an da derxist.
Di gelek rojname û kovaran de nivîsand.





# 28 sal bi ser şehîdbûna Pêşmerge û xebatkar
# Elî Umer Xelîl re derbas dibe

Kurdistan-
Emel Hesen

Navê Siyanî : Elî Umer Xelîl
Dîroka Jidayikbûnê: 11972-1-
Dîroka Geheştina nav rêzên pêşmergeyî de: 1991
Dîroka şehadetê: 11-1992-10
Cihê kar û bar : Pêşmergê hêza neh leşkerê doo

Dema ku em ferhenga dîrokê vekin, bê guman pakrewanê nemir "Elî Umer " rûpelên dîrokê bi Xebat û xwîna xwe ya zelal xemilandiye, wê demê bala mere gelek tiştan dikişîne, mere dixwaze bizanibe ev e ki ye û lawê kê ye û xelkê kîjan deverê ye? Elî Umer yek ji wan leheng û mêrxwazên Rojavayê kurdistanê ye, li "Gundê Rîhanîkê"yê ser bi bajarê "Dêrikê"ve ji dayik bûye, herwiha tê zanîn ji malbateka Niştîmanperwer û Şoreşgere, herwiha bavê wî mirovekî zana bû di warê çandiniyê de û di nava xwedî û xwedanê xwe de kesek Navdar û qedirgiran bûò û bavê heft zarokaye, ji ber ku gelekî girêdayî bi Ax û Ava xwe ve karê wî yê sereke Cotyarî bû , lê tevlî barê xwe yê giran û astengên jiyanê wî bavê hêja û Xebatkar karîbû hestên evîna Welat di hiş û ramanên dilên zarokên xwe de biçîne.
Pakrwanê nemir di sala 1978an de ket dibistanê, her wiha qonaxa yekem bi dawî kir, sala 1984an ta wê Astê, dev ji Xwendinê berda da ku alîkar be bi bavê xwe re, dest bi kar kir lê her û her di bîr û baweriyên wî li ser, fikir û ramanên netewa rêbaza Barzanî hebû, tevlî refa Partiya Demokrat a kurd bû,



ji biçûkbûna Ciwaniya xwe, herwiha xortek gelek jîr û jêhatî bû, bi karê xwe ve girêdayî bû, berdewam bû li ser kar û xebata xwe, dilê wî pak û paqij bû ji bixuz û kînê , ji hemî Malbat û dost û hevalên xwe hez dikir, van pesnên herî baş hîşt ku pakrwan Elî bibe cihê rûmet û rêzgirtinê di nav hevlên wî yên partiyê de.
Dema kû Serhildana kurdî ya Kurdistana Başûr dest pê kir di Bihara sala 1991ê de, Şehîd "Elî Umer ""dev ji dilovaniya bavê xwe û xwişk û birayên xwe û dost û hevalên xwe berda, pişta xwe da feleka bêbext û berê xwe da Şoreşa Başûrê Kurdistanê, rahişte Çeka rûmetê mil bi milên birayên xwe yên pêşmerge re şer kir di sengerên berxwdanê de li dijî rêjîma Şoveniya Beis a xwînmij, tevlî lîwa 9an ya li lsêmêlê siriya 2 bû pêşmergê şoreşgêrê kurdistanê
Di destpêkê de, ew bi Eniya Kurdistanê l zaxo bû, beri hingi Digel heza agir bi, wî gelek şeran şer kir, heya rizgarkirina hemî Kurdistanê ji pîsbûna rejîma hilweşiyayî, û bi terikandina koalîsyona navneteweyî ya Kurdan re, rejîma dîktator dest pê kir li dijî şerekî dijwar ê ( Paşê, ji bo destpêkirina bombebarankirina deverên Kurdî bi hemî çekên giran, destpêkirina koçberkirina sivîlan hem li Sûriye û hem li Tirkiyê. Di derbarê Pêşmerge de, ew ji nû ve li çiyayên Zaxo û Dihok bicîh bûn, ku Şehîd yek ji bi sedan J pêşmergeiyên ku ji Kurdistanê derneket, û ji ber tirsa "Fransa û Brîtan "ya ji pêkanîna komkujiyan li dijî Kurdan, wan nexşeyek aram danîn Ji bo parastina Kurdan, Pêşmerge dîsa vegeriya meydanên şer li dijî bermahiyên zalim da ku çavkaniya meşrûbûna Kurdistanê (Parlamento) û hemî saziyên din ên hukûmetê azad bike Û Pişt re, ( Seîd Umer) jî tevlî Hêzên Pêşmerge bû û ew (birayê piçûk ê Elî) tevî temenê xwe yê Ciwan di wê demê de, ev tiştek şanaz diyar dike ev wateya wan ya neteweyî li hember gelê wan û nêzîkatiya nemir Barzanî nîşan dide, û ew di heman lîwa û alayê de ye, lê destê Munun nêzîkê Şehîdê ku şerên dijwar dikir bû Li dijî dijminên Kurdan, û ew li nêzê keleha Şebanikê l devera behininê li Zaxo di 111992 10-- de hate şehîdkirin d şerê berevanikrin j perlaman û hukometa kurdistanê , birayê xwe yê piçûk hişt ku di nav refên partiyê de, kadroyek pişt re, û Serokek navdar şer bike, û hêjayî gotinê ye ku ew di Merasîmek bi heybet de li Qedaya Sêmêl , komelgeha misirikê,ya ser bajarê Dihok ve hate Veşartin. Oxir be Şehîdê xaka pîroz, bi aramî serê xwe dane Goristana rumetê lê berî ti têkiv xewa azadiyê xelatik xweş li rewanê te diyarî di vê roja herî xemgîn de, bi sedan lawên şox û şepal îro Navê te li bejin û bala wan e her wisa rahiştin e Çeka te di sengerên berxwedanê de amedene û berevaniya xaka Kurdistanê dikin û herwiha birayê te yê Rênas pêşmergeyê deşit û ciyan,Egîdê mêrig û zinaran û xwediyê erkê netewî"Seîd Umer " rêka te dişopîne û şevnema gulên şoreşê divejîne li ser rêk û rêbaza Barzaniyê nemir dîwarên azadiyê avadike ji hemî leyana ve çi Siyasî û çe Çivakî û çe Leşkerî, bijî Malbata pakrewanê nemir, "Elî Umer"
Rûmeta ebedî ji giyanê wî yê pak re, şerm û şerm ji dijminên mirovahiyê re.

# Şandina çekdarên Sûrî bo Azerbeycanê

Kurdistan-
Îsa Mihemed

Çekdarên opozîsyona Sûriyê yên ku li Efrînê dimînin, niha hejmareke ji wan ji bi şerê li Qerebaxê têne şandin. Rewangeha Sûriyê ya mafên Mirovan dibêje, ew çekdar ji fesîleyên wek El-Emşat û Sultan Murad in ku Tirkiyê piştevaniya wan dike û di rêya wî welatî jî ji bo wê deverê têne veguhestin bi mûçeyê du hezar Dolarî. Çekdarên opozîsyona Sûriyê li kêleka Azerbeycanê şerê Ermenistanê dikin, û heta niha jî hejmareke zêde ya wan çekdaran hatine kuştin û hinek jî dîl hatine girtin, helbet şandina van çekdaran karvedanên mezin li pey xwe aniye, û ji aliyê gelek dewletan ve ev yek hatiye şermezarkirin.Rûsiya çend caran ragehandiye ku şandina çekdarên Sûriyê ji bo şerê li Qerebaxê rû dide metirsîdar e û dê rewşaê aloztir dike, herwiah Ferensa jî ev yek şermezar kir û daxwaz kir ku şandina çekdarên Sûrî ji bo wê deverê were rawestandin. Hin alî dibêjin ku Tikriyê ev yek ji berya demekê ve amade kiriye da ku ev çekdar tevlî vî şerî bibin.

Welatiyek dibêje berya niha şandina çekdaran ji bo Lîbyay bû, û niha jî ji bo Azerbeycanê berdewam e, gelo ev opozîsyon gihiştiye çi astê heta ku çekdaran wek murtezeq dişîne wan welatan, ev yek rûreşiyeke ji opozîsyona çekdar ya Sûriyê re.

Welatiyekî din jî dibêje, bila ev çekdar biçin wan welatan û welatiyên Kurd yên li Efrîn û Serêkaniyê ji wan xilas bibin. şandina van çekdaran bi pilan jia liyê Tikriyê ve tê kirin û egere ji bo şerê li dijî PKKê jî têne bikar anîn.



# Nivîskar Nezîr Gumuş dîwaneke Mela Sîraceddînê Xelîlî belav dike (1..2)

## "Divê berhemên windayî bêne rizgar kirin"

Kurdistan-
Sîpan Xelîl

Piştî belavbûna berhema "Gulcivîn", Rojnameya Kurdistan hevpeyvînek taybet bi Nivîskar Nezîr Gumuş re pêk anî ku ev jî beşek ji vê hevpeyvînê ye.

*Em dixwazin ji xwendevanên Kurdistana Sûriyê re bidin naskirin Nezîr Gumuş kî ye?
Nezîr Gumuş di sala 1980yî de li Kerborana Mêrdînê hatiye dinyayê. Bi eslê xwe ji gundê Xelîla ye ku gundekî Eşîra 'Erebiyan e û bi Kerboran ve girêdayî ye.
Navê bavê wî Emîn e. Zaroktiya wî li Kerboran derbas bûye. Di sala 1986an de dest bi dibistana seretayî kiriye. Perwerdehîya xwe ya navîn di sala 1997an de li Kerboran temam kiriye.
Piştre di sala 1998an de li Zanîngeha Celal Bayarê li beşa "Ziman û Edebiyata Tirkî" dest perwerdeya lîsansê kiriye. Di sala 2002yan de zanîngeh xilas kiriye û di 'eynî salê de li Cizîrê dest bi mamostetiya Tirkî kiriye. Di van salan de li Cizîr û Şernex dersa Tirkî daye. Piştre jî di sala 2006an li Batmanê heman wezîfe domandiye.
Di sala 2010an de li Dîlokê di Dunya Tvyê de dest bi xebatê kiriye. Di Dunya Tvyê de bi zimanê Kurdî karê çêkerî, pêşkêşvanî, wergerî hwd. kiriye.
Di sala 2011an de li Zanîngeha Mardîn Artukluyê li beşa Çand û Zimanê Kurdî dest bi perwerdeya masterê kiriye û jê mezûn bûye.
Sê bername bi zimanê Kurdî (Helbestên Nemir, Kurdî Hîn Dibim, Hûn Çi Dibêjin?) amade û pêşkêş kirine. Di vê demê de dersa Kurdî daye xwendevanan.
Nezir Gumuş bi sê hevalên xwe re "Ferhenga Kurdî-Tirkî" amade kiriye. Ev berhem berhema Kurdî ya pêşî ye ku ji aliyê Weşanxaneya Saziya Zimanê Tirkî (Turk Dil Kurumu) ve hatiye çapkirin. Di dawiya sala 2015an de dest bi şêwirmendiya Altan Tan kiriye û bi qasî sê salan ev wezîfe domandiye. Ji sala 2018an ve dersa Kurdî û Îngîlîzî dide.




• "Gulcivîn " çi ye ?
"Gulcivîn" Dîwana Mela Sîraceddînê Xelîlî ye ku ji dîwanên girîng ê edebiyata Kurdî ye. Dîwana di destê me de dîwaneke serdema edebiyata klasîk a dawî ye. Xelîlî bi xwe ev nav li dîwana xwe kiriye. Di dîwanê de143  helbest cih digirin. Em dikarin bibêjin ku ev dîwana di destê me de dîwaneke muretteb e. Di dîwanê de ji xeynî çend tîpan, bi hemî tîpên alfabeyê, helbest hatine nivîsandin. Tenê bi tîpên c, f, q, x'yê helbest nehatine nivîsandin. Êdî ji ber çi bi van tîpan helbest nehatine nivîsandin, em baş vê nizanin. Dibe ku ev helbest winda jî bûbin. Em vê yekê bi zelalî nizanin.

• Naveroka wê çi ye gelo?
Naveroka dîwanê gelekî berfireh e. Yanî; Ne't, muhaceat, hikmet, we'z û nesîhet, tewazu, dostanî, rexne, mersîye û medhiye û hê gelek cur û mijarên cuda di dîwanê de cih digirin. Em dikarin ji van mijaran hinek beytan li jêr rêz bikin:

Bexîlî yû îman kesî nedî ketin qelbê kesî
Yek toz e yek wek melkesî her dû ji hev re dijmin in
...
Nîv êş û jan çi ta ye nîv rehm xwe ewr û ba ye
Mewlîdxwên nîv mela ye ʿeza ye nîvê muxtar
...
Ne l'mêjker nîv nesar e cahil ku nîv dewar e
Şerwal ku nîv sitar e j'aşî re nîv e destar
...
Wellahî zanim dunya betal e
Tellahî zanim gorin me mal e
Ewna cih e bo her can û kal e
Ê vê nizanê ew kor û lal e
Paşî Muheqqeq ew dê bi tehsê
Hawar ji destê dunya û nefsê...
...
Nefsa me bulbul dunya gula sor
Gava dinê dît pê bûye mexror
Pîra hezar sal pê bûye wek hor
Zahir bi çav e nefs e di xef kor
Yan 'Enter e yan ew lawê Qeysê
Hawar ji destê dunya û nefsê...
...
Dunya eger ku xweşyê bidê te



Paşî Muheqqeq reşyê didê te
Paşatiyê ger ewna bidê te
Reş dê girêdê ew ser serê te
Kes nîn e ku lê naêne keysê
Hawar ji destê dunya û nefsê...

Zimanê Mela Sîraceddînê Xelîlî çawa ye?
Mela Sîraceddîn di dîwana xwe de Kurdiyeke dewlemend bi kar aniye. Di destpêkê de em dikarin bibêjin ku cihê ku jiyana xwe lê derbas kiriye, navenda Kurdistan û Kurdiyê ye. Lewra ji bo demeke dirêj herêma Botan ji bo 'ilm, çand û Edebiyata Kurdî wekî navend xwe daye qebûlkirin. Em dikarin bibêjin ku Zimanê Kurdî jî herî baş li vê herêmê dihate istimalkirin.
Mela Sîraceddîn piraniya 'emrê xwe li herêma Botan derbas kiriye. Qismê dî jî li Herêma Torê derbas kiriye. Jixwe axaftina van herêman ji ber ku nêzîkî hev in, ji hev zêde ne cuda ye. Êdî bandora van her du herêman jî li ser zimanê wî heye. Lêbelê ji ber ku cihê jidayîkbûna wî ye em dikarin bibêjin ku herêma Torê hinekî serdesttir e.
Em dikarin bi rehetî vê bibêjin ku Mela Sîraceddînê Xelîlî ji aliyê zimên ve gelekî serkeftî ye. Zimanê ku di helbestê de bi kar aniye, xurt û herikbar e. Xelîlî bi Kurdî, 'Erebî, Farisî û Tirkî dizanîbû. Em dikarin bibêjin ji xeynî Tirkî di her sê zimanên dî de gelekî serkeftî ye. Lewra helbestên spehî bi van her sê zimanan nivîsandine. Helbestên wî yên bi Tirkî gelekî zeîf in. Êdî di Tirkî de axaftina wî jî wilo ye an na, em vê baş nizanin. Eşkere ye ku Tirkiya wî li gorî zimanên dî zeîf e. Lewra wî di saziyên fermî de perwerde nedîtiye, di medreseyan de perwerde dîtiye û di şûna Tirkî; 'Erebî û Farisiya wî bi pêş ketiye. Wekî din zimanê wî gelekî sivik e û di roja me de bi hêsanî tê fêhmkirin. Peyvên ku bi zimanên biyanî bi kar anîne jî, fêhmkirina helbestê zehmet nakin. Ji bo ku zimanê wî yê helbestê hinekî were fêhmkirin em ê niha li jêrê hinek mînakan ji dîwanê rêz bikin:

Qenc guh bidin gellî biran vê şîretê hiffiz bikin
Da hilnedin barê giran roja ji qebrê derkevin
....
Goştê te ax hestî çiya pirça te wek dar û giya
Xûn rengê ava kaniya her dem diherkê wek şetek
....
Guh nede şeytan û nefsê her divin kû tu bitehsê
Bi ser û pa herê hepsê divedin pêşya te dav

• Çima te ev berhema Mela Sîraceddînê Xelîlî hilbijartiye?
Li gorî min ev berhem, gelekî hêja ye û heta niha bi tîpên latînî nehatibû weşandin. Li serê, lêkolîneke baş nehatibû kirin. Gelek berhemên wiha giranbiha winda bûne û çûne. Min xwest ku ev berhem derkeve bazara Edebiyata Kurdî û pêşberê xwendevanên Kurd. Bi vî rengî berhem ji tunebûnê xilas dibin. Ji xwe berhemeke dî ya Mela Sîraceddîn ji ber bêxwedîtî winda ye. Ji xeynî vê jî ez bi xwe jî ji gundê Xelîla me, yanî gundiyê Mela Sîraceddîn im. Ji ber vê jî min xwest ku ez li ser vê berhemê bixebitim. Ez bawer dikim ku berhem jî hejayî wê kedê ye ku em li serê xebitîn.